Doktorê hemû tiştan dizane
**Nivîsîn û wêne:** Mats Rehnman
**Wergera ji Swêdî:** Xelîl Duhokî

## *Paşmayîya çîrokeka gelî*

Carekê cotyarek hebû ku navê wî Pêr bû. Rojekê çû bajarî da ku berazekê bikirre, lê ji bo wî zehmet bû ku birryarekê bide. Demê ew li wêrê rawestayî û hizir dikir, kesekê xapînok hate wêrê.
“Guh bide cotyar”, xapînokî gotî,”pareyekê baş di destê te de ye.”
“Belê belê”, Pêrî bersiv da. “Min û jina xwe her civandin û civandin. Hêviya me ew bû ku berazekê bikirrîn. Lê ez dê kîjanî kirrim? Hemû rind û ciwan in ku min divê wan ramûsim!”
Xapînokî hizir kir ku dibe ev cotyare, aqilsivik û gêj be. Dê bi hêsanî ête xapandin.” Tu dizanî”, wî got. “bi vî pareyî tu dê bikarî tiştekê ji berazî baştir peyda bikî. Wî pareyî bide min û ez dê te kime peyayekî hêja û bi rûmet.”
“Peyayekê hêja? Ev e dê çawa be?”
“Ev e karekî hêsan e, dibe te bivê bibî qeşe? Yan jî doktor?”
“Te go doktor!” Pêrî hewar kir. Xuyaye ku tiştekî baş e, wî çaxî ez çi azar û êşan jî nakişînim. Sibehê heta êvarê ez dê li ser kursîyê rûnim û bi pozê xwe ve mijûl bim!” Xapînokî bi lez cantikê xwe vekir û ji bo Pêrî çakêtekê sor deranî û kulavekê mezin jî, da ku bike serê xwe.
“Wesa! Min nego dê hêsan be. Niha tu dikarî biçîye mal û hindî te bivê, doktorîya xwe bikî.” Wî pare birin û ji wî cihî windabû.
Pêrî temaşayî xwe kir û wesa xwe dît ku yê xweşik û çeleng bûyî û ji dil digirrnijî. Ew bi lez ber bi malê ve çû, da ku xwe nîşanî jina xwe bide. Dema ew ketîye hundir, hewar kir: “Girêtaya min Girêta, were temaşa bike!”
“Xudêwo”, jinkê gotî û destên xwe li hev dan. “Ez ku li benda berazekî bûm. Ev e tu yî wesan rêkûpêk!” Dema Pêrî gotî ku yê bûye doktor, pirr kêfa jinkê hat û ji xweşîya de, li dor wî reqisî. “Eger tu doktor bî, hîngê ez jî doktore me!”
Pêrî got: Ev e weha ye, weha ye ev e, weha ev e weha ye.
Di destpêkê de, xelkê gundî bi wî dikenîyan, demê difna xwe bilind dikir û li wan dorûbera digerrîya. Lê dema wî li serederê mala xwe tabloyek dana, ku li ser nivîsî bû Doktor Pêr, hîngê xelk nerazî û dilteng bûn. “Hosan bi hêsanî kes nabe doktor”. Mebesta wan ew bû.” Divê ew ji vî karî poşman bibe,”
Her zû delîvek çê bû ku dersekê bidine Pêrî. Rojekê pasevanekê şahî hate gundî. Wî vegêra ku şahê welatî yê nexweşbûy û kes nikare çareser bike. Hîngê xelkê destên xwe ji bo mala Pêrî dirê kirin û gotin: Li wêrê doktorek dijî ku şareza û jîr e. Ew dikare çareserîya tevaya nexweşîyên cîhanê bike. “Lê ew tembel û serhişk e. Divê wî neçar bikin ku çareserîya xelkê bike. Lê, divê bi zûrê be !”
Pasevanî li dergehê mala Pêrî da. Bê pirs milê wî girt û ber bi erebya xwe ve rakêşa. Her çiqas Pêrî hewar û hêvî kirin, lê bê sûd bû. Ew ji gundî dûrketin û ber bi koşka şahî ve hajotin. Li pişt wan jî, çendîn kes pê dikenîyan.
Li dawîyê dema Pêr li beramberî şahî rawestîya, pirr ditirsîya û reqreqa didanên wî bû.
Şahî pirsî:”Erê tu yî doktor Pêr?”
“Belê, erê navê min Pêr e û ji min re dibêjin doktor.”
“Baş e, zikê min diêşe, jan dike û disoje, werimîye û qurrqurr dike. Te divê min sax bikî?”
“Ha, min divê. Lê ez nikarim”, Pêrî bersiv da.
“Peyvên pûç”şah xeyidî û sor bû. “Min guhlê bûye ku tu tembel û serhişk î. Berî ku bibe êvar, ger tu min sax nekî, hîngê şêrê min wê te bixwe.”
Niha Pêr pêtir tirsîya. Lê, demê Pêrî soz day ku hewil bide, reqereq ji didanên wî dihat û çokên wî jî dilerzîn. “Şahê min”, kizgiryok kete hefkê. “Şermizar im ku daxwazê dikim ku rê bideye min da ku hindekê hizir bikim.” Xwe çemand û dihejîya û ji eywanê derket.
Ew di nav koşkê de çû û di dawîyê de gehişte nav baxçeyî.
Niha divê ew çi bike? Wî nediwêra birreve û ne jî dizanî çawan şahî sax bike.
“Çi şêtek im”, posîde û dilteng bû. “Ji bo çi min ev çakêtê doktorîyê kire ber xwe? Ez dê bime xwarina şêrî. Girêta belengaz; niha ew dê bê beraz û bê mêr jî bimîne.” Divê ew hewil bide ku bi rêyekê xwe rizgar bike.
Doktorekê birastî, divê gulûgiya bicivîne û dermanan jê dirust bike. Wî çend pel xirrvekirin. Gulek jî kir û got: “ Yeka weha jî dibim.”
“Eger ev e bi kêr nehat, dibe eva din baş be.”
Dema baxevanî hewil da rê lê bigire, ku di nav gulan re neçe, Pêr xeyidî û sor bû.” Rê ya doktor Pêrî çûlkin!” Li dawîyê bersîngê xwe tijî kiribû. Wî hemû tiştên xwe birin xwaringehê. Li wêrê menceleka mezin ya bi destik ji xwarinçêkerî wergirt û hemû gulûgiyayên xwe tê de kelandin. Xwelî, pîvaz û her çi xwêya di xwaringeha şahî de hebû, her hemû berda nav mencelê. Xulkê xwarinçêkerî têkçû û xeyidî. Bi rastî jî ev derman e? Bêhneka pîs jê dihat û dûkêl jê diçû.
Dema Pêrî sênîka şorba kesk pêşkêşî şahî kirî, wî bêhnek helkêşa û got: “Divê ez vê bixwum?” Wî kevçîyek jê xwar. “Tam û çêjeka pirr nexweş e.” Piştî kevçîyê duyê, serûçavên wî kesk bûn. Axînek jê hat. “Tendirustîya min xerab e”, piştî kevçîyê sêyê, bêserûber bû û kete wêrê û hewar kir:
“Ax zikê min! Ax, ax, wî divê min bikuje. Alîkarîya min bikin, ez jehirkirî bûm!”

Lê di wê gavê de, şahî dest bi verreşînê kir. Di bêhnekê de, wî du legen, pêlavek û setlek tijî kirin. Wî bi diltengî ve got: “Lo vaye hêştan tê”, verreşîya nav guldankê û sênîka şorbê jî.
Dema ew tişt bi dawî hatîn, rûnişt û got: “Niha ez baştir im! Min bawerî heye ku doktor Pêrî ez sax kirim.”
Yê ji tevayan guhişîtir, doktor Pêr bi xwe bû. Ew pirr dilxweş bû ku medalyayek û tûrekê paran wergirt.
Dikare karekê baş bi evqas pareyî bête kirin, mebesta Pêrî ew bû. Ew li wê navê gerrîyabû û mezintirîn beraz kirrî bû. Dema ew zivrrîye malê, hind ji xwe razî bû, ku li ser tilîyên pên xwe bi rêve diçû. Hewar kir: “Girêtaya min Girêta!” dengê wî li hemû gundî belv bû. “Min şah saxkir. Heta bêjî hêsan bû.”
Paşî ew bi şanazî di nav xelkê de gerrîya ku ew baştirîn doktor e di welatî de.
Wî gotî: “Ez her tiştî dizanim.” Ev e weha ye, weha ye ev e, weha ev e weha ye.” Wî ji bo pîremêran bas dikir ku çawan çalan bikolin û ji bo pîrejinan jî, ku çawan tevnî birêsin. Wî ji bo mîhan bas dikir ku çawan marînê bikin û ji bo beqan ku çawan wîrrwîrrê bikin. Wî bi tevayî xelk bêhinteng kiribû.
Di encamê de, dema wî tabloyeka nû li derveyî mala xwe danî, ku li ser nivîsî bû: DOKTORÊ HEMÛ TIŞTAN DIZANE, êdî xelk bi tevayî bêzar bûn.
“Hemû tiştan dizane!” wan got: “Tu bêjî Pêr hemû tiştan bizane? Kes nîne hemû tiştan bizane. Divê ew ji vê poşman bibe.”
Rojekê dîsan pasevan hate ve gundî. Wî vegêrra ku dizan dirr û cewahirên şahî dizîne û kesê nekarîye wan bigire. Ev e ji bo xelkê delîveke din bû, ku keysa xwe li Pêrî bînin. Wan got ku doktorê ku hemû tiştan dizane û di vî gundî de dijî, hemû tiştan dizane û dikare. Eger yek hebe ku dizan aşkera bike her ew bi xwe ye.
Dema pasevanî Pêr anî, Girêtayê gelek hewilda ku zelamê xwe ji destan rizgar bike, lê bê sûd bû.
Girêtayê hewar kir: “Wî hêştan nanê nîvroyê nexwarîye.”
Pêrî berevanî ji xwe kir, lê pasevanî ew bilind kir û kire di nav erebane de û ji gundî derket. Paşî Girêta bi siyarî hat û bastirmek(sucuq) ji bo zelamê xwe anî. Girêtayê qîjand: “ Divê ew bixwe.” Mixabin ku hêj negehiştîye wan, bastirme nema bû.
Di encamê de, careke din Pêr li beramberî şahî rawestîya.Wî bi tirs temaşayî şêrî dikir ku devê xwe dialîsî.
“Ne xwe wilo Pêr! Niha tu nasnavê doktorê ku hemû tiştan dizane li xwe dikî, “Şahî gotî. “Ku weha be, divê te belge ji bo navê xwe hebin. Divê berî ku bibe êvar, tu dirr û cewahirên min peyda bikî û dizan jî bigirî. Yan na tu dizanî wê çi bê serê te.”
Hind sehm û tirsê Pêr girtibû ku dengek jê nedihat. Lê Girêta xeyidî bû. “Hûnên hêja, ev çi tevlihevîye hûn dikin, qey divê zelamê min, bi zikê birsî rav û nêçîra dizan bike?
Nexêr, pêş hemû tiştî, divê hûn mêvandarîyeke baş bikin.” Paşî şah kenîya û ferman da ku rûnin.
Yekser rewşa Pêrî baştir bû. Rojên hosan dest nakevin ku şah mirovekê hejar mêvanî xwarinê bike. Wî pistepistek kir: “Binêre Girêta! Min bihîstîye ku li cem kesên hêja û jêhatî, mirov ne bi tenê corekê xwarina baş dixwe, belku mirov gelek coran dixwe.” Bi lez dergehek vebû û karkerekê ku kodikek (tasek) helgirtibû, hate hundir. Pêrî bang kir: “Girêta temaşake! Ev e yê yekê ji wê ve hat!”
Helbet mebesta wî xwarin bû, lê çinku karker yek ji dizan bû, wî wesan hizir kir ku mebesta wî ew e. Ew narihet û hêbetî bû, li demê xizmetkirinê, şorbe bi ser xwe de kir. Dema ew çûye di xwaringehê de, karkerên din agehdar kirin û got: “Niha tirseka mezin û bi lez li rê ye. Doktorê ku hemû tiştan dizane, destê xwe dirêjî min kir. Bêdudlî (şik) wî em yên aşkera kirîn!” Dema karkerê duyê bi sênîkekê hate eywanaxwarinê, Pêrî bang kir:” Temaşa bike Girêta, ma min negot? Ev e yê duyê ye!” Yekser Girêta ber bi xwarina nûhatî ve çû. Lê karker hind tirsîya bû ku sênîk û perdax(qedeh) li hev xistin. Dema karkerê sêyê jî, ji bo xizmetê hatî, her ew tits rû da.
Pêr piştî xwarinê çû derve. “Niha ez têr bûm.” wî got. “Piştî min şêr jî wê têr bibe, çinku ez nuzanim, mirov çawan rav û nêçîra dizan bike.”
Wî careke din jî, xwe di nav baxçeyî de dît. Her çawa be, divê ew hewlekê ji bo girtina dizan bide. Di wê gavê de, her sê karker bi lez hatin û xwe avêtine ber pên wî û daxwaza lêborînê kirin. Wan got: “ Doktorê qenc! Em nikarîn direwa li te bikîn, tu hemû tiştan dizanî. Em bûn ku me dirr û cewahir dizîn. Soz didîn ku wan vegerînîn, lê alîkarîya me bike ku şah me neke xwarina şêrî.”
Pêr heyran bû. Bi vê şêweyî girtina dizan hêsan bû? Dilê wî bi wan şewitî û soz da ku alîkarîya wan bike. Wî got: ” Dirr, cewahir û parçeka goştê mezin bînin, em dê şahî, şêrî û hemû cîhanê jî xapînîn.”
Dema ew tişt jê re anîn, wî dirr û cewahir di nav goştî de veşartin. Paşî gazî şêrî kir: “Ka were ez dê tiştekê xweş deme te.” Şêrî parça goştî rakêşa û bi leqekê daîra.
Pêr pirr ji xwe razî bû, dema bi lez ber bi koşkê ve çûyî. Wî bang kir: “Hêjayê min! ez dizî nas dikim! Şêr e.” Şah mat û heyirî bû. Pirsî: “Çawa vê dizanî?”
Pêrî bersiv da: “Eger mirov hemû tiştan bizane, dê weha be. Ev e weha ye, weha ye ev e, weha ev e weha ye. Dirr û cewahir yê di zikê şêrî de.”
Dema şahî hizir li ser derxistina wan dikir, Pêrî got: “Divê şêr jî, tam û çêja wî dermanî bike yê ku şahî kirî.”
Di demekê kurt de, bêhna şorba kelandî ya Pêrî hemû koşk dagirti bû.
Şahî şêr neçar kir ku dermanî, kevçî bi kevçî bixwe. Paşî şêrî dest bi verreşandinê kir. Çemekê tevav ji paşmayîyên xwarin û kevrên bi nirx rijîyane ser erdî.
Şahî hewar kir: “Gencîneya min! Doktorê hemû tiştan dizane, gencîneya min peyda kir. Hemû li wê navê hatin û çûn û ji xweşîyan de, sema kirin. Pêrî xelatekê mezin û kulavekê mezintir jî wergirt. Zelaman hîrehîr û jinan qîjeqîj dikir, wan ew bilind dikir û dikenîyan. Girêtayê jî, ew dirramûsa û himbêz dikir.

Karkeran jî divîya supasîya Pêrî bikin, çinku wî ew rizgar kirin. Wan jî ew pare, dirrr û cewahirên ku kiribûne di berîkên wî de, dizîn.
Dema ku Pêr vegerîyaye malê, ew bi qasî cadûgerekê yê dewlemend bû.
Wî gotî: “Girêta hizir bike, şahî ew hemû dirr û cewahir hene, lê wî yek beraz jî nîne. Ev e hejarî ye.”
Dema ew hatine meydanê(panavê), xelkê ew nas kirin. Hemûyan pistepist dikirin.: “Temaşa, ev e doktorê ku hemû tiştan dizane, zîrektirîn zelamê cîhanê.” Lê zelam û jinkê pîte bi wan nekirin, belku mijûlî hejmartina berazan bûn, ka wê çenda peyda bikin. Li dawîyê bûne gelek ku hemû xanî, axurr û kolkê mirîşkan jî tijî bikin.
Di encamê de, ew bi dilxweşî heta hetayê bi hev re jiyan; lê ku digel berazan bijî, ew ji hemû tiştan xweştir e. Ev e weha ye, weha ye ev e, weha ev e weha ye. Çinku ev e doktorê ku hemû tiştan dizane, gotî.

---